

December 2018

ولينا  
سور

# Pelika sor a ku pê re bû, yek ji sedemên rêderdiya wî bû

Çîroka "Mamo Hesên Elo" ..  
Ji bilî bênasnametiyê, car bi car dihatim  
pîskirin



## **"Pelika sor a ku pê re bû, yek ji sedemên rêderdiya wî bû"**

Çîroka "Mamo Hesên Elo" .. Ji bilî bēnasnametiye, car bi car  
dihatim pîskirin

Dema ku "Mamo" xwendekarê zanîngehê, ji aliyê hêzên ewlekariya Sûriyê ve rastî lêdan û pîskirina bi peyvan hat, ji ber ku ew yek ji Kurdên Sûriyê yên bê nasnameyê "ejnebî" ye, û gava ku mezin bû jî, rewşa wî ne çêtir bû, û ev ne bûyera dawî bû a ku rastî wê tê, çî ku berpirsekî şaxê ewlekariya siyasî li bajarê Serê Kaniyê şiqamek li wî da û peyvên pîs jê re got, ji ber ku wî nepejirand ku wekî saloxdar "muxbir" ji wan re kar bike.

Di sala 1978an de "Mamo Hesên Elo" li bajarê [Serê Kaniyê](#) jidayik bûye, û ji dema serjimêriya awarte a ku rêjîma Sûriyê di sala 1962an de pêk anî, ew yek ji Kurdên Sûriyê yên bê nasnameyê "ejnebî" ye, û di vê barê de ji lêkolînerê ser erdê "gerok" li ba Sûriyên ji bo Rasteqînê û Dadmendiya re, di Avdara sala 2018an de got:

**"Di sala 2001ê de, û gava ku ez bi kernekê "otobasê" ji bajarê Serê Kaniyê diçûm zanîngeha xwe li bajarê Helebê, hin endamên hêzên ewlekariya Sûriyê, li ser pîra Qereqozatê me sekinandin, û pîrsa nasnameyên rêwiyan "rikaban" kirin, û min jî pelika xwe a sor derxist, vêca endamên wê hêzê min ji kernekê daxistin, û li odeyê wan a taybet ku li ser pîrê bû, jêpîrsîn û lêkolîn bi min re kirin, herwiha rastî lêdan û pîskirinê hatim, tev ku wan dizanîbû ku ez ne di ti partiyê de me, û li dawiyê min qewirandin, û min riya xwe berdewam kir, û ev bi tenê rûpelek ji pirtûka rêderdiyê ye".**


Mamo yekê ji bûyerên ku hîn di bîrdanka wî de asê maye û ziyaneke kûr gîhandiye derûniya wî bi bîr tîne, ku di sala 1995an de, berpirsekî şaxê ewlekariya siyasî ji wî xwest ku wekî saloxdar ji wan re kar bike, û Mamo nizanîbû ku nepejirandina wî dê bibe sedemek ji bo pîskirina wî û malbata wî, û peydakirina astengiyên di riya wan de, û di vê barê de got:

**"Serokê şaxê ewlekariya siyasî li bajarê Serê Kaniyê bi navê "Ebû Îhab" dihate naskirin, û carekê ji caran, wî ji min xwest ku ez wekî saloxdar ji wan re kar bikin, û gava ku min nepejirand, şiqamek li min da, sixêf bi min kir û bi dudre min qewirand, û ev yek bi birayên min Ibrahîm re jî kir, û ne tenê wîlo, ku bi dudre dikanên me yên hesinkariyê 12 rojan li pey hev girt, ji ber ku em bê nasnameyê "ejnebî" bûn, û rêdanên me yên kar tune bûn".**

Ji piştî vê bûyerê, Mamo pelikên xwe ji saziya karûbarên civakî ya bajarê Hîsiçayê re pêşkêş kir, da ku rêdanên kar bidest bixe, lê serokê şaxê ewlekariya siyasî "Ebû Îhab" şand pey wî, û careke din li wî da, û peyvên pîs jê re gotin, çî ku wî ev daxwaz pêşkêş kirye.

Li gora Mamo, ku rewşa wî a yasayî ta çaxa amadekirina vê raporê jî nehatiye guhertin, û ew hîn bê nasnametî ye, tevî derxistina biryara [\(49\)](#)an di sala 2011an de, a taybet bi dana nasnametiya Sûriyê bo kesên ku bê nasnametî "ejnebî" ne.

سوريون  
من أجل  
الحقيقة  
والعدالة  
Syrians  
For Truth  
& Justice



## Derbarê rêxistina Sûriyên Ji Bo Rasteqînî û Dadmendiye:

Ew rêxistineke Sûrî ye, ku serbixwe, nedesthilatdar, û ne fêdekare. Endamên wê ji herdu zayendan Sûrî ne, ku tev cihêrengbûna bawerî û pêkhatayên wan, berevaniyê di ber mafên mirov de dikin, herwiha di nav tîmê wê yê damezirêner de, kesne akadîmîsyen ji welat û regeznameyên dîtir ve jî hene.

Rêxistin ji bo Sûriyeke demokrat kar dike, ku tevahiya hemwelatîyên wê ji herdu zayendan, di siya dadmendiye, û wekheviya mafên mirov de, bi rûmet bijîn.

---

🌐 [www.stj-sy.com](http://www.stj-sy.com)

📘 [syriaSTJ](https://www.facebook.com/syriaSTJ)

🐦 [@STJ\\_SyriaArabic](https://twitter.com/STJ_SyriaArabic)

📷 [Syrians for Truth & Justice](https://www.instagram.com/SyriansforTruthandJustice)

✉ [editor@stj-sy.org](mailto:editor@stj-sy.org)